Çîrok û serpêhatiyên kurdî



# GURÎ

Amadekar: **Zinar Soran**

**APEC**

Çîrok û serpêhatiyên kurdî



# GURÎ

Amadekar: ZINAR SORAN

Weşanên APEC

No: 50

# GURÎ

## Çîrok û serpêhatiyên kurdî

Amadekar: **Zinar Soran**

© APEC-TRYCK & FÖRLAG

Spångavägen 345
Box 3318
S-163 03 Spånga / Sweden

Tel: 08-761 81 18
Fax: 08-761 24 90

ISBN: 91-87730-50-2

1993

Weşanên APEC

# PÊŞGOTIN

Zargotina kurdî gelekî dewlemend e. Bi hezaran helbest, stran, çîrok, serpêhatî û metelokên kevn, heta îro jî di nava gelê Kurd de dijîn. Lê mixabin, di warê nivîskî de edebiyata kurdî li gor wê dewlemendiyê pêş ve neçûye. Dijminên Kurdistanê ew keys û firsend nedaye neteweyê Kurd ku ziman, edebiyat û çanda xwe bi şîweyekî azad pêş ve bibe. Heta ji dest wan hatiye, xwestine ku ziman, edebiyat û çanda kurdî ji holê rakin. Bi gotinek din, zilm û zordariya li ser neteweyê kurd, li ser ziman, edebiyat û çanda wî jî heta îro bi dijwarî dom kiriye. Ji ber vê yekê jî, gelek çîrok, serpêhatî û helbestên hêja nehatine weşandin û hinek ji wan di nava pêvajoyê de wenda bûne.

Ji bo vê yekê, vatiniyeke gelek girîng e ku heta ji dest bê, em çîrok, serpêhatî, stran, helbest û metelokên kurdî yên di nava gel de, bidin hevdu û wan biweşînin. Bi vî awayî, em dê ji aliyekî wan ji wendabûnê xelas bikin û ji aliyê din jî, perçeyeke jiyan û têkiliyên wan deman raxîne ber çavan û ji wan îstifade bikin.

Pêkanina vê vatiniyê, îro ji her demê bêtir pêwîst e. Ji ber ku radyo û bi taybetî jî televizyon di nava bajar û gundên Kurdan de gelekî belav dibin. Dijmin bi riya van weşanan jî, li hember ziman û

kultura kurdî, şerekî bi dizî dimeşîne. Ev weşan li ser ziman û çanda kurdî tesîrên neyînî dikin. Ziman û kultura kurdî nikare xwe weke berê li hemberî van êrîşên dijmin biparize. Dengbêj û çîrokbêjên me êdî weke berê şevbuhêrkên civata kurdî naxemilîne. Zarokên Kurdan weke berê bi çîrok û metelokên kurdî nakevin xew.

Hejmara dengbêj û çîrokbêjên me êdî bi tilîkan tên hijmartin. Eger ew jî herin ser heqiya xwe û ji nava me koç bikin, wê gelek stran, çîrok û serpêhatiyên me jî bi wan re koç bikin. Ji bo vê yekê, divê em beriya ku zêde bi derengî keve, bêtir hewl bidin ku ji devên dengbêj û çîrokbêjên xwe, stran, çîrok, serpêhatî û metelokên kurdî binivîsin û wan ji wendabûn û koçkirinê xelas bikin. Xebatên weha, wê edebiyata kurdî jî bêtir pêş ve bibe û dewlemendtir bike.

Piraniya van çîrok û serpêhatiyên kurt yên di vê pirtûkê de hatine civandin, berê di hejmarên kovara zarokan "Kulîlk"ê de hatibûn weşandin. Min xwest ku ez wan di ber çavan re derbas bikim û weke pirtûkekê jî nû ve çap bikim.

Di vê derê de, bêyî ku ez pênivîsa tu nivîskarên Kurd birîndar bikim, dixwazim tiştekî din jî diyar bikim ku çîrok û serpêhatiyên weha yên di nava gel de tên gotin, ne malên tu nivîskaran in; xezîne û dewlemendiya gelê Kurd in. Ji ber vê yekê jî, ez xwe nivîskarê wan nabînim, hew berhevkar ya jî amadekarê wan dibînim.

Tebax 1993
**Zinar Soran**

# GURÎ

Gurî ji biçûkanî de, dê û bavê xwe wenda dike û sêwî dimîne. Ew dikeve ber destên ap û amojinê. Wan çi karê giran hebûya, bi Gurî didan kirin. Rojekê dilê Gurî pir diçe rûnê nîvişk. Dihere cem meşka rûn, hinek rûn li ser nanê xwe dike. Amojina wî pê dihise. Radihêle darçîtekî û bera dû Gurî dide.

Gurî ji wan dixeyide û sûnd dixwe, ku ew dê terka wan bike. Gurî dihere gundekî. Li wî gundî dawet heye. Govendek mezin geriyaye. Qîz û xort ketine destên hevdu, toz û dûxanê bi ser serê xwe dixin. Piştî rawestandina def û zurnê, dest bi danîna xwarina dawetê dikin. Cifniyê mezin tije birinc û goştê berxa li ser, dikşînin bin konê reş û mezin. Wek her kesî Gurî jî derbasî ser sifra hazir dibe û têra dilê xwe xwarinê dixwe. Ji xwe, ev demeke dirêj bû ku Gurî xwarinek weha nexwaribû.

Hinek xortên gund dinerin ku xortekî biyanî, gurî û bi kum li ser sifrê rûniştiye. Ew dixwazin hinekî heneka bi wî bikin. Gava ew xwarina xwe diqedînin, dihêrin cem Gurî û destên xwe bi kumê wî paqij dikin.

Ber bi êvarê, naxir dikeve nav gund. Çêlekek ji



nav naxirê di ber Gurî re derbas dibe, bîhna rûnê kumê Gurî tê çêlekê. Çêlek devê xwe davê kumê


wî. Gurî bera dû çêlekê dide ku kumê xwe ji devê wê derxîne. Çêlek berê xwe dide dewsbênderan û Gurî dide dû. Ji bo ku bala Gurî li çêlekê ye, ew lê hay nabe ku çalek li pêşiya wî ye û di wê çalê de werdibe. Çal hinekî kûr e. Ew nikare bi serê xwe ji çalê derkeve. Di dilê xwe de dibêje; "Çawa be dinya havîn û germ e. Ez dê îşev di vê çalê de razêm."

Dibe êvar, tarî dikeve erdê. Bûka nû dixwaze derkeve destavê. Ji bo ku dinya tarî ye û gund nas nake, ew jî li çalê hay nabe û di wê çala ku Gurî tê werbûyî de, werdibe. Herdu ji tirsa ne diwêrin bi hevdu re bipeyivin û ne jî gazî û alîkariyê bixwazin. Her yek li aliyekî çalê rûdinin û diponijin.

Demek derbas dibe, bûk venagere malê. Xwediyê zavê bawer dikin ku bûka wan bi dû hineka ketiye. Gaziya gund bi dû bûkê dikeve. Her çend gundî bi hêlekê de diçin û li bûkê digerin. Xortek jî fanosek di desta de ye û dixwaze bigihêje gaziyê. Gava tê dewsbênderan, dibîne ku Gurî û bûk di çalê de ne. Xort bi dengekî bilind gazî gundiyan dike:

- Wernê va ew li vir in! Xwedê ji wan re nehiştiye. Gava reviyane, di çalê de werbûne. Her ku dihere însan li ser çalê pirtir dibin û her yek ji hêlekê bi keviran tê wan. Gurî û bûk dizanin ku çi bibêjin wê feyde neke û baweriya gundiyan wê bi wan neyê. Melê gund xwe digihîne ser wan. Ji gundiyan re dibêje:

- Heyran, hela rawestin, em ifada wan bigrin.



Piştî gotinên Mele, bêhna Gurî hinekî tê ber wî. Piçek hêviya wî çêdibe. Baweriya wî pê tê ku ew dê êdî neyê kuştin. Gurî bi dengekî melûl ji serî heta dawiyê serpêhatiya xwe ji Melê re dibêje. Ji bo ku Gurî şiklê çêlekê jî ji gundîyan û Mele re dîbê; gundî nas dikin ku ew çêleka mala Mîsto ye. Mele ji xortan re dîbêje:

- Zû, bi lez herin çêleka mala Mîsto bînin vê derê. Xortek dihere çêlekê tîne. Çêlekê li wê derê şerjê dikin. Gava zikê çêlekê diqelêşin, dibînin ku kumê Gurî di zikê wê de ye. Mele vedigere ser gundiyan û dibê:

- De binêrin! Tu nemabû me zilamekî biyanî û bêguneh bîkuşta û qetla wî di stuyê xwe xista.

Piştî gundî dibînin ku Gurî bêguneh e, li ber wî digerin. Rebenê Gurî xweziya xwe bi vî awayî jî tîne, ku ew ji vê belaya mezin û nedîtî weha bi erzanî xelas bûye.

Gurî ji bo çûyinê destûra xwe ji gundiyan dixwaze. Gundî çiqasî dikin û nakin, Gurî wê şevê li gund namîne. Ew ji nav gund derdikeve û dikeve ser riyekê. Berî ku ew bigihêje gundekî din, xanîyekî dibîne. Gava dihere hundirê xanî, dibîne ku kadînek kayê ye û kes tê de tune ye. Peyvên rîhspiyan tên bîra wî, ku cihê germ û nava kayê ji birînên kevir û daran re gelekî baş e. Gurî biryara xwe dide ku wê şevê li wê kadînê razê. Ew xwe dixe nava kayê û hew serê xwe ji derve dihêle.

Pir derbas nabe, jin û mêrek ku hevdu revandine dikevin hundirê kadînê. Ji bo ku hundir tarî

ye, ew li Gurî hay nabin. Herdu li ser kayê li tenişta Gurî rûdinin. Piştî bêhna xwe berdidin, keçik ji mêrik dipirse:

- Ka bibêje, bê çawa dilê te kete min?

- Gava tu diçû ser kaniya gund, te kûzê avê dida ser milê xwe û xwe bi nazikî dihejand, eşq û evina te dest pê kir; di dilê min de zîl da û roj bi roj bêtir şax veda.

Piştî bersîva xwe, vê carê jî mêrik ji keçikê pirsî:

- Baş e. Lê dilê te çawa kete min?

- Gava tu bekçiyê gund bû, darê te di destê te de bû, te bi darê zorê bac û bêş ji xelke distend...

Bekçî nehişt ku keçik peyva xwe biqedîne, perwaz da û bi pozbilindî got:

- Belê weha bû. Navê darê min "Lahdo" bû. Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim, min bi Lahdo weha li wan dixist. Bekçî bê ku li Gurî hay bibe, weke ku bi rastî bêşê ji gundiyan distîne, darê xwe li ser hev û bi hêrs li tenişta xwe, li Gurî dixîne û hey dibêje:

- Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim, hema min radihişt "Lahdo" û weha li wan dixist.

Gurî ji bo çend darên pêşî deng nekir. Lê gava dît ku darê Bekçî rawestan jê re tune ye, janê da dilê wî, hew debar kir û ji nişka ve got:

- Heyran bes li min xwe, ez ê jî bêşa xwe bidim.

Bekçî û keçik ji tirsa bizdiyan. Nizanîbûn bê çi hat serê wan. Herdu bi bazdan ji kadînê direvin. Gava bi wê lez û bezê direvin, keçik buxçika xişil

û zêrên xwe li dewsa xwe ji bîr dike.

Piştî ew direvin, Gurî ji nav kayê derdikeve, radihêle buxçikê û bi kêf dibê:



- Xwedê qismetê min anî ber destên min. Va ye min ceyizê xwe dît. Ya baş ew e, ku ez êdî ji xwe re qîzekê jî bibînim, bizewicim û ji ber destên ap û amojinê derkevim.

# TAYA QOLÇÎ

Ev çend roj bûn, xeber gihaştibû gund ku wê qolçî werin. Rojek du rojên pêşî piraniya gundiyan tûtin û qutiyên xwe veşartin. Roj bi roj qasî ku ji wan re pêwîst bû, tûtin û pelên xwe dixistin nava paçikan. Lê piştî ku çend roj derbas bûn û qolçî nehatin, gundiyan dîsa weke berê rahiştin qutî û hesteyên xwe. Wan baweriya xwe pê anîn ku êdî qolçî nayên gund.

Di nav gundiyan de, Hadî weke gundiyên din nedifikirî. Ji tirsa qolçiyan wî qutiya xwe bi xwe re nedibir odeya gund. Piştî çendekî, Hadî jî êdî baweriya xwe pê anî ku qolçî nayên. Hadî berê xwe da paş xanî. Çû ser çala ku tûtin û qutiya xwe tê de veşartibû. Tûtin û qutiya xwe derxist û hat malê. Qutiya xwe tije tûtina Xursê kir, destek pelê Şamê jî da ser û berê xwe da oda gund.

Hadî hîn xweşikî rûniştibû, du qolçî û du cendirme ketin devê deriyê odê. Hadî qirqilî; qutiya xwe xist bin kulav, dilê wî rehet nebû. Ji wir derxist, xist bin balîfê, dilê wî rehet nebû. Rahiştê xiste bin kurkê xwe, dîsa dilê wî rehet nebû...

Hadî nizanîbû bê çi bike. Hema berî hemûyan qutiya xwe derxist, dirêjî qolçî kir û got:

- Heyran, hela hûn berî her kesî ceza min bibirin! Ev çend roj in ku ez di vê tirs û tayê de bûm. Bila ez ji vê tayê xelas bibim.

# BÎRAYÊN POZQUT

Hebû tunebû, li bajarekî sê bira hebûn. Ew zengînên wî bajarî bûn. Bazara wê derûdorê di destên wan de bû. Terş û dewarên xelkê bi erzanî dikirîn. Ji ber ku tucarên din tunebûn, xelk mecbûr diman ku terş, dewar, hirî, rûn û penêrên xwe bifroşin wan. Ne xelkê ji wan hez dikir û ne jî ew bi hevdû re rast bûn.

Li nêzîkî wî bajarî gundek hebû. Li wî gundî bi navê Rizgo cotkarek hebû. Rizgo dixwest ku heyfa xelkê ji wan hersê bira hilîne. Rizgo qasidekî dişîne cem wan û ji qasid re dibêje ku hinek dewarên wî yên firotinê hene. Hersê bira ji bo kirîna dewaran tên wî gundî.

Rizgo fenek xweşik ji bo wan hazir dike. Du kîroşkên wek hevdu spîboz peyda dike. Berî ku here ser cot, ji pîreka xwe re dibê:

- Binevşê! Gava ew hersê bira hatin, tu wan bişîne ser cot. Ji bo şîvê jî, ji me re elokekê şerjêke, birincekê û tirşikek fasûla jî bi ser de. Gava em werin malê, bila şîva me hazir be. Dawiya mayî tu bispêre min.

Piştî van gotinan, Rizgo gayên cot ji êxur derxistin. Kîroşkek li malê bi singekî ve girêda. Rahişt kîroşkê din û berê xwe da ser cot.

Hersê bira hatin gund. Li mala Rizgo pirsîn.

Zarokên gund mala Rizgo nîşanî wan dan. Pîreka wî Binevşê ji hersê biran re got, ku Rizgo li ser cot e û cotê wî li binya gund e.

Hersê bira berê xwe dan ser cot. Gava gihiştin cem Rizgo, silav li wî kirin. Berî ku dest bi bazara dewaran bikin, bala wan çû ser wî kîroşkê spî. Kîroşkek bi gomakî mezin ve girêdayiye. Kîroşk spîboz weke berfê ye û pir xweşik e. Ew meraq dikin û ji Rizgo dipirsin:

- Birako! Ma ji bo çi ev heywanê reben û xweşik li ber vê tava germ girêdayiye?

- Hew, hûn mesela wî nizanin. Ew "Peyê Sivik" e. Ew kîroşkekî pir bi aqil û zîrek e. Ez kurdûnda me. Hew keçikek min heye. Kurê min tuneye ku kar û suxrên min bike. Gava tiştek ji min re lazim dibe, ez ji kîroşkê xwe re dibêm, ew jî dihere ji kevaniya min re dibê. Mesela ez niha ji "Peyê Sivik" re bibêjim ku here malê, ji kevaniya malê re bibêje mêvan hene, bila filan xwarinê ji me re çêbike; wê di cî de here malê û ji pîreka min re bibêje.


Hersê bira gelekî şaş mabûn. Kirîna dewaran ji bîr kiribûn û çavên xwe bera kirîna vî kîroşkî dabûn. Birayê mezin ji Rizgo re got:

- Heyran, me gelekî meraq kir. Ji bo vê yekê jî, em dixwazin îşev mêvanê te bin. Ka temiya xwe li kîroşk bike û wî bişîne malê.

Rizgo hate cem kîroşk. Werîsê di stûyê wî de vekir û got:

- Binêre Peyê Sivik! Tu zû bike, bilezîne. Here ji kevaniya malê re bibêje ku mêvan hene. Bila ji

me re elokekî ser jê bike. Birincekê û tirşikek fasûlya bi ser de. Bila êvarî şîva me hazir be



Piştî wan gotinan, Rizgo Kîroşk berda. Kîroşk berê xwe da çolê û bi lez ji wan dûr ket. Gava

hersê bira dîtin ku Kîroşk ne ber bi gund direve, ji Rizgo pirsîn:

- Baş e. Ji bo çi kîroşkê te rast û rast berê xwe neda gund û neçû?

Rizgo di bin simêla de keniya û bersîva wan da:

- Ne hûn "Peyê Sivik" nas nakin. Ew pir bi aqil e. Ji bo kûçikên gund neyên wî, ew li dora gund dizîvire û dûre dihere malê.

Ber bi êvarê, Rizgo cotê xwe berda. Wî û hersê bira berê xwe dan gund. Mêvan derbasî malê bûn, çi bibînin! Ew xwarinên ku Rizgo ji kîroşk re gotibû, li ser sifrê hazir in. Kîroşk jî, bi singekî ve girêdayiye û êmê xwe dixwe.

Hersê bira şaş û mat mabûn. Wan dev ji kirîna dewaran berdabûn û dixwestin bi çi dibe bila bibe, vî kîroşkî bikirin. Wan dest bi doza kirîna kîroşk kirin. Gava Rizgo dît ku ew li bazara kirîna "Peyê Sivik" sor dibin; wî jî bêtir xwe delalî dikir. Wî dixwest bide nîşandan ku ew naxwaze kîroşkê xwe bifiroşe. Her sê bira li ber Rizgo digeriyan û digotin:

- Em sê tucarên pir mezin û zengîn in. Mêvane me pir deherin û tên. Ji dewsa ku em zêde xulam û navmaliyan bigrin, em dixwazin vî kîroşkî bikirin. Hema tu çi bixwazî em ê bi te din. Me ji "Peyê Sivik" pir hez kir. Wê pîrekên me jî gelekî jê hez bikin. Em mêvanên te ne, ji bo xatirê mala xwe divê tu me neşkînî.

Piştî wê libergerandinê, Rizgo got:

- Heyran bawer bikin, min tu carî kîroşkê xwe nedifirot. Lê hûn dest û lingên min girê didin. Ji

bo xatirê we û mala xwe, ez ê kîroşko xwe yê li ber dilê min pir giranbiha ye, bi sed zêrî bidim we. Lê bila hûn baş bizanibin, eger hûn ne mêvanên min bûna, min tu carî "Peyê Sivik" nedifirot.

Hersê bira sed zêr dan Rizgo, birayê biçûk rahişt kîroşk û hersê bira berê xwe dan bajêr. Ji kêfa devê wan nedihat hev. Dema gihiştin malê, werîsekî zirav û rengîn xistin stûyê kîroşk û du caran ew di riya nava malê û sûkê de birin û anîn, ku "Peyê Sivik" riya malê baş nas bike. Dûre şandin pê hemû kesên bi nav û deng yên bajêr û xwestin zîrekiya kîroşkê xwe nîşanî wan bidin. Di civînê de, kîroşkê xwe danîn ser maseyekê û birayê mezin li ber mêvanan ji kîroşk re got:

- Ya heywanê baqil, ya "Peyê Sivik"! Tu bi lez here malê. Ji kevaniya malê re bibêje ku mêvan hene. Bila ji me re ji bo şîvê berxekî şerjêke û bavêje ber birincê. Qadiyê me ji ecînê pir hez dike. Bila ecînê jî, ji bîr nekin ha!

Piştî wan gotinan, birayê mezin kîroşk ji ser masê daxist û bera sûkê da. Feqîrê kîroşk ji tirsa direviya vî aliyê sûkê û wî aliyê sûkê. Pir derbas nebû, qelebalixiyek mezin bi dû "Peyê Sivik" ketibû.

Gava qadiyê bajêr ev rewşa dît, bêhna wî gelekî teng bû û bi hêrs ji hersê bira re got:

- Ev çi ye? Ma kesekî din nema, ku hûn henekê xwe bi me dikin! Ji bo ku hûn zengîn in, hûn di ser xwe re çûne. Ma qey hûn li xwe hay nabin,

bê hûn çi dikin? Çi heqê we li vî heywanê reben hebû ku we bera nava sûkê da. Ma qey hûn nizanin, wê zarok kîroşk bi keviran bikujin.

Birayê mezin hinekî mizmizî, hate cem qadî û got:

- Seydayê hêja! Ew çi gotin in, tu dibêjî. Hedê me ye ku em henekê xwe bi kesên mîna we bi rûmet û giranbiha bikin. Hûn kîroşkê me nas nakin. Ew heywanekî pir biaqil û zîrek e. Navê wî "Peyê Sivik" e. Kesek nikare bigihije wî. Gava em êvarî çûn malê, hûn dê huner û zîrekiya wî bi çavên serê xwe bibînin.

Bû êvar. Hersê bira û mêvanên wan berê xwe dan mala birayê mezin. Birayê mezin dît ku şîva ji kîroşk re hatibû gotin, li holê ne xuyanê ye. Gazî pîreka xwe kir û bi hêrs jê re got:

- Keçê ma kanî şîva mêvanan?

Jinika reben haya wê ji mêvanan û şîva wan çênebûbû. Wê gavê birayê mezin fêm kir, ku "Peyê Sivik" nehatiye malê û Rizgo ew xapandiye. Di dilê xwe de got: "Heger em vê yekê ji te re bihêlin, bila em ne ji dola bavê xwe bin".


Mêvan gelekî aciz bûn û bi xeyd ji malê derketin. Hersê bira şêwra xwe kirin û biryar dan ku sibê herin ser Rizgo, heyfa xwe ji wî hilînin.

Rizgo jî dizanîbû, ku wê hersê bira werin heyfa xwe. Ji ber vê yekê jî, wî ji niha de haziriya xwe kiribû û feqek nû li ber wan vedabû. Rizgo kerekê dibe ser cot. Çend zêran dixe bin teriya kerê û li benda wan dimîne.

Gava ew tên cem cot, berî ku ew dest bi peyvê

bikin, Rizgo ji wan re dibêje:

- Wey hûn bi xêr hatin û ser çavên min re



hatin ya dostên hêja. Lê hayê we ji kerê min hebe; hûn destên xwe nedin wî! Gava hûn dest

kerê min bidin, wê zêrê min ji dawiya wî biweşin.

Hersê bira mesela kîroşk ji bîr kirin û ketin meraqa rastî û nerastiya gotinên Rizgo. Yek ji wan hate cem kerê û tepek lêxist. Ker berê hatibû tirsandin. Kerê da zîtoka û çend zêr ji dawiya wê ketin erdê. Çavên hersê biran çû nava serê wan. Bê ku gotinê zêde bikin ketin bazara kerê. Lê Rizgo xwe giran dikir û nedixwest bide diyar kirin ku ew di-xwaze kerê bifiroşe wan. Piştî bazariyek dijwar, Rizgo ker bi sed zêrî firot û ji wan re weha got:

- Binerin! Divê hûn baş li kerê miqate bin. Şevê olçekek cehê spî bidinê û leganek ava hênik li ber wî deynin. Divê binê odeya kerê bi xalîçe be û gelekî paqij be. Gava hûn baş li kerê binerin, hûn dê her sibe, têra xwe zêran bidin hev. De hûn û qismetê xwe.

Hersê bira ker dan ber xwe û berê xwe dan bajêr. Şeva ewilî, birayê mezin ker bir malê. Wî û pîreka xwe oda mêvanan ji kerê re vala kirin. Xalîçeyek ecemî li odê raxistin. Olçekek cehê spî û leganek ava cemidî danîn ber kerê û derî li ser wê kilît kirin.

Bi berbanga sibê re, birê mezin şiyar dibe û rast berê xwe dide oda mêvanan. Gava devê odê vedike, çi bibîne! Ode di bin rêxê de maye. Mirov ji bîhna rêxa rohn nikare serê xwe di hundur xîne. Xalîçe û dîwarên odê ji rêxê hatine xemilandin.

Birayê mezin di dilê xwe de dibêje: "Ya baş ew

e, ku ez vî tiştî ji birayên xwe veşêrim. Bila ew jî ji vê "xêr û bereketê" bê par nemînin. Ne weha be, wê henekê xwe bi min bikin û ez ê li ber wan kêm bikevim".

Birayê mezin gazî pîreka xwe dike. Pîreka xwe baş temî dike. Odeyê xweşik paqij dikin ku birayên wî pê dernexîne bê çi tofan hatiye serê wan. Bîstek derbas dibe, herdu birayên wî tên. Bi kêf û meraq ji birayê xwe pirsîn:

- De ka ji me re bibêje, bê te çend zêr dane hev?

Birayê mezin, çend zêrên pîreka xwe tîne nîşanî wan dide û dibêje:

- Bi serê bavê min hew ev çend zêr tenê min dan hev. De qey qismetê min ewqas bû.

Birayê navîn ker da ber xwe û bir malê. Ew tiştê hatibû serê birayê mezin, hate serê birayê navîn jî. Lê wî jî nexwest ku vê yekê ji birayê xwe yê biçûk re bibêje. Bi wî awayî birayê biçûk jî ji wê "xêr û bereketê" bê par nema. Birayê biçûk ji herdu birayên xwe re got:

- Hey malxerabino! Ma hûn ji Xwedê natirsin, ji evda jî fedî nakin? Em dê kengî weke birayên xelkê bi hevdu re rast bimeşin? Ma we mala xwe di bin rêxê de hişt, çima we ev tişt ji min re negot? Ma min çi tade û xerabî bi we kiribû? Hema ez çi bibêjim bê feyde ye. Mala we ne ava û biratî ne heqê we.

Piştî bîhna birayê biçûk hinekî hate ber wî, hersê bira bi hevdu şêwirîn. Tevdîra xwe kirin yek. Biryar dan ku vê carê Rizgo bikujin; heyfa

kevin û nuh jê hilînin.

Rizgo jî dizanîbû, ku wê hersê "birakên" wî werin. Çavên wî li riya wan bû. Lê tedbîra xwe jî, ji niha de girtibû. Wî feqa xwe ya vê carê weha ji pîreka xwe re dida diyar kirin:

- Ez ê hinek xwîn di torbakî naylon xînim û wî torbeyî di binê kitana te de veşerim. Gava ew hatin, ez ê tiştekî ji te bixwazim. Lê tê serhişkiya bikî û wê daxwaza min pêk neynî. Ez ê xwe biqeherînim û kêrê bidim ser qirika te. Torbe wê biqete û xwîn wê bi ser qirka te keve. Dûre ez dê li bilûrê xînim û tê rabî ser xwe û bireqisî. Bi wî awayî ez ê bixwazim ku ew mesela kerê ji bîr bikin û ew li kirîna bilûrê sor bibin.

Rizgo tevna xwe ya nû li dar xistibû û çavên wî li riya her sê bira bûn. Gava her sê bira ketin mala Rizgo, ew ji ber wan rabû û bi qêrîn gazî pîreka xwe kir û ji wê re got:

- Keçê zû were! Mêvanên me yên ezîz hatine. Kulavêkî nû ji me re raxîne û zû çayek bi dem ji me re çêbike. Niha mêvanê me betilîne.

Weke ku li hevdu kiribûn, Binevşê rû neda mêvanan û di ber xwe de got:

- Ne bi xêr û ne bi selamet! Ma qey ez ji kar û suxrên mêvanên te xelas nabim. Her roj mêvan, her roj mêvan...

Hîn Binevşê peyva xwe temam nekiribû, hema Rizgo rabû ser xwe, rahişt kêra malê, bi serê pîreka xwe girt, avêt erdê û kêr da ser qirka wê. Torbê xwînê teqiya û xwîna sor li kitana spî zû veda. Hersê bira şaş û mat mabûn. Yekî ji nav

wan got:

- Hey malxerab, ma mirov ji bo diltengiyek weha biçûk pîreka xwe dikuje!

He rsê bira şaş mabûn û nizanîbûn bê çi bikirina. Ji fedya serê xwe bera ber xwe dabûn û diponijîn. Birayê mezin vegeriya ser herdu birayên xwe û bi dengekî nizim ji wan re got:

- Xwedê bela xwe dayê. Tiştekî em bikin nema. Ya baş ew e, em dev ji wî berdin û herin malka xwe.

Hîn wan weha şêwra xwe dikir, Rizgo gazî qîza xwe kir û got:

- Keçka min, tu wê bilûrê ji bavê xwe re bîne! Diya te dîsa serhişkî kir. Bi zorê bîhna min teng dike.

Gava Rizgo dest bi lêxistina bilûrê kir, pîreka wî Binevşê rabû ser xwe û reqisî. Hersê bira dîsa şaş û mat mabûn. Lê di ber xwe de gotin:

- Bi hersê navê Xwedê, ev bilûr ji me re pir baş e. Jinên me serhişk in. Xwe pir delalî dikin û ji me jî zêde natirsin. Em dê her yekê carekê wan ser jê bikin, dûre li bilûrê xînin û wan sax bikin. Bi vî awayî em dê hinekî çavên wan bitirsînin. Eger ew hinekî netirsin, bi wan re nayê qedandin.

Teva ku bi dengên nizim bi hevdu re dipeyivîn jî, dengên wan dihat Rizgo. Birayê mezin doza kirîna wê bilûrê li Rizgo kir. Lê Rizgo xwe li firotina bilûrê nedikir xwedî û weha digot:

- Heyran, hûn dibînin ku jina min pir serhişk e. Gava ew serhişkiya dike, bîhna min zû teng dibe.

Eger ne ji vê bilûrê ba niha min jina xwe zû de kuştiba. Ez ditirsim ku bê bilûr jî, ez rojekê bi-



qeherim û pîreka xwe ser jê bikim. Ji ber vê yekê, ez naxwazim bilûra xwe bifiroşim.

Hersê bira li ber Rizgo geriyan û gotin:

- Divê tu vê qenciyê bi me bikî. Jinên me gelekî serhişk û pozbilind in. Mêvanên me pir tên û her car ew me li ber mêvanan fedîkar û rûsar derdixînin. Bi saya vê bilûrê, em dê wan hinekî bitirsînin. Bi soz û peyman, eger tu bixwazî, dûre tu dikarî bilûra xwe paşde bigrî.

Bi wî awayî li hevdu kirin û Rizgo bilûr bi sed zêrî firot wan.

Roja ewilî, birayê mezin bilûr bir malê. Li pîreka xwe mana geriya. Di dawiyê de, bihna xwe teng kir, bi qirika pîreka xwe girt avêt erdê û bi kêrê qirika wê birî. Xwînê pijiqand ser çavên wî û pir derbas nebû jinikê can da. Piştî bîstekê rahişt bilûrê û lê xist. Lê jinik ranebû ser xwe. Dengê bilûrê bilindtir kir, lê dîsa jinik ranebû ser xwe. Ew bi tepan bi xwe ket, lê êdî feyde nedikir. Wî çalek mezin di xanîkê kewaran de kola, meytê pîreka xwe xist wê çalê û di ber xwe de got:

- Ya baş ew e, ku birayên min pê nehisin. Bila ew jî wek min ji vê "xêrê" bê par nemînin. Ne weha be, wê kêfa wan li min were û wê henekê xwe bi min bikin.

Roja din, birayê navîn tê û ji birayê xwe dipirse:

- Ka tu ji birayê xwe re nabêjî, bê feyda bilûrê bû ya na?

- Çawa nebû! Bi hersê navê Xwedê, hîngî pîreka min tirsiyaye, ew newêre were hundir. Bûye weke şima yê.

Birayê navîn jî, bi wî awayî pîreka xwe şerjê dike. Lê ew jî, ji birayê xwe yê biçûk re nabêje. Birayê biçûk ji weke herdu birayên xwe pîreka xwe ser jê dike.

Piştî ku hersê bira pîrekên xwe bi wî awayî dikujin, êdî rohnî di çavên wan de namîne. Soz û peyman didin hevdu, ku vê carê çi dibe bila bibe, divê Rizgo ji destên wan xelas nebe.

Birayê biçûk gelekî qeherîbû û ji herdu birayên xwe re got:

- Bi her sê navê Xwedê, vê carê jî hûn werin lîstika Rizgo, ez dê bi destê xwe we bikujim. Ma çend û çend ji destê vî segbavî.

Piştî sê rojan, Rizgo çavderiya her sê bira dikir. Wî baş dizanîbû ku piştî sê rojan wê hersê bira werin ser ruhê wî. Loma jî, fen û feqa xwe ya dawî hazir kiribû. Rizgo ji pîreka xwe re got:

- Tu dizanî wê her sê bira werin ser min û bixwazin heyf û tola xwe ji min hilînin. Ez bawer im ew niha gelekî tûre bûne û wê bixwazin vê carê di cî de min bukijin. Divê ez jî lîstikek weha bînim serê wan ku êdî nikaribin derkevin nava civatê û di heyata xwe de ji bîr nekin. Em dê gorekê li nava goristana gund bikolin. Taqekê di wê gorê de bihêlin. Ez dê bi gûzanekî berbera têkevim gorê. Gava her sê bira hatin, tê ji wan re bibêjî ku birakê wê do çû rahmetê. wî di ber mirinê de wesiyet kir ku hûn herin ser gora wî.Taqek di gorê de vekirî hiştiye. Serê xwe di wê taqê xînin, çend ayetan li ser bixwînin û wî bêhn bikin. Belkî bi xêra duayên we gunehên wî

hinekî sivik bibin û Xwedê wî efû bike.

Rizgo û Binefşê çûn nav goristana gund û gorek fireh kolan. Rizgo teva gûzanê xwe kete wê gorê, Pîreka wî taqek di gorê de hişt û ser gorê xweşik girt.

Pir derbas nebû, hersê bira hatin mala Rizgo. Bi kîn û hêrsek mezin li wî pirsîn. Binefşê bi kelogirî ji wan re got:

- Ma qey we nebihîstiye? Birakê wê do çû ser heqîya xwe, vefat kir. Berî bimre jî, wesiyet kir ku hûn herin ser gora wî, serê xwe têxin taqa gorê, çend ayetan li ser ruhê wî bixwînin û wî bêhn bikin. Belkî bi xêra duayên we, gunehên wî hinekî sivik bibin û xwedê wî efû bike.

Her sê bira di ber xwe de gotin:

- Em ê herin ser gora wî. Lê ne ji bo em ayeta li ser wî bixwînin. Ji bo em dilê xwe di cî kin; bê bi rastî ew segbav miriye ya na?

Her sê bira dan dû hevdu û berê xwe dan nav goristana gund. Gava çûn ser gora Rizgo, birayê mezin serê xwe xist taqa gorê û got:

- Segbav kurê segbava! Tu ji destên me xelas bû û bi emrê Xwedê mir. Weleh vê carê me dê ruhê te bi destên xwe bistenda. Lê şansa te hebû ku em negihiştin ser te...

Hîn birayê mezin gotinên xwe dawî neanîbû, Rizgo bi pozê wî girt û di ber de jêkir. Birayê mezin destê xwe da ser pozê xwe, nexwest ku birayên wî bibînin û got:

- Elahûmeselî ela Muhemed. Çi bêhna cinetê ji vî bênamûsî tê.

Dor hatibû ser birayê navîn. Gava wî serê xwe xist tirbê, Rizgo firsenda xebera nedayê. Hema bi bêvila wî girt û gûzan avêtê. Wî jî destê xwe da ser bêvila xwe û weke birayê xwe yê mezin got:

- Elahûmeselî ela Muhemed. Bi rastî jî bîhna bihiştê ji vî kûçikbavî tê.

Birayê biçûk jî serê xwe xist taqê û çend xeber ji Rizgo re dan. Rizgo bi bêvila vî jî girt û di ber de jêkir. Birayê biçûk vegeriya ser herdu birayên xwe û ji wan re got:

- Lawo, malxerabino, bêbextino! Ma çi doz û dawa we bi min re hebû ku we ev bêbextî bi min kir. Jixwe, ji ber ku em bi hevdu re ne rast in, em weha bêbext in ku ev bela û tofanî hatin serên me. Taliya talî, me bêvilên xwe jî li ser kir. Ma em dê bi çi rûyî derkevin nava civatê?

Her sê bira, polîpoşman dan dû hevdu û berê xwe dan malên xwe. Rizgo bi wî awayî heyf û tola xelkê ji wan hilanî.

# QOLÇÎ Û GUNDÎ

Rojekê Mîrzo ji bo firotinê, barek êzing dibe bajêr. Êzingê xwe difiroşe, asûkê xwe dikire û dixwaze hinekî li nav bajêr bigere.Lê di wê demê de, qolçî hebûn. Wan nedihiştin ku xelk tûtina wê derûdorê vexwin. Ji tûtina Kurdîstanê re digotin "tûtina kaçax". Feqîrê gundîyan gava dihatin bajêr, ji tirsa qolçîyan xweşikî nikarîbûn cixareyek bi kêfxweşî vexwarana. Dema ku qolçiyan hinek gundî didîtin, bi dû wan diketin. Li ser wan digerîyan û gava tûtin li ser wan bigirtan, ceza ji wan distendin.

Mîrzo jî weke gelek gundiyên Kurdistanê, ji destên qolçiyan pir kişandibû û gelek caran ceza dabû. Hingî dabû dilê wî, sûnd xwaribû, ku vê carê li nav bajêr cixara "kaçax" vexwe.


Gava qolçiyekî dît, ku dûxana cixarê bi ser yê gundî ketiye, bi lez xwe gîhand cem wî. Li ser wî gerîya, barê kerê wî avêt erdê, li nav barê wî gerîya; lê tu tûtin nedît. Qolçî gelekî aciz bû. Lê nekarîbû tiştek bikira.

Mîrzo barê xwe avêt ser kerê û riya xwe berdewam kir. Piştî sed gavekî ji qolçî bi dûr ket, dîsa dûxan bi ser serê xwe xist. Qolçî bi bazdan xwe gîhand cem wî. Weke cara din li ser wî gerîya, barê wî dîsa avêt erdê, ew ji hevdû xist, lê tu tûtin nedît. Qolçî gelekî tûre bû.Tu nemabû ji qehra biteqîya. Lê tişt ji destan nedihat.

Mîrzo barê xwe bar kir, qederkî meşîya û dîsa

dûxan bi ser serê xwe xist.

Qolçî dîsa bi bazdan çû cem Mîrzo. Helke helka wî bû, bêhna wî çikiya bû. Ji hêrsa bi zorê gotin digîhand hevdu. Qolçî bi libergerandin ji Mîrzo



re got:

-Heyran,welleh te kezeba min reş kir. Bi soz û peyman û bi sê telaqên bêfito, eger tu cihê tûtina xwe rê min bidî, ez ê tu cezayî ji te nestînim.

Mîrzo bawerî pê anî, ku qolçî wî tiştî ji dil dibê. Mîrzo çû cem kerê xwe, tûtina xwe ya ku di nav paçikekî pêçabû, ji guhê kerê derxist û rê Qolçî da.

Qolçî bîhna wî gelekî teng bû. Lê ji bo soz dabû û bi telaqan sûnd xwaribû; tu ceza li Mîrzo nebirî. Piştî çend gavan, Mîrzo dîsa dûxan bi ser serê xwe xist.

# HEVALTIYA KERAN

Serhad bi berbanga sibê re rabû, werqîlên êzingan li ser kerên xwe şidand û berê xwe da çiyê. Di demek kurt de, sê bar êzing jêkir û ket ser riya bajêr.

Kerekî wî gelekî xurt bû, ço ne digîhand xwe û hergav li pêşiyê diçû. Kerê din teva ku ne wek yê pêşî bû; wî jî bargiraniyek mezin ji xwediyê xwe re dernedixist. Lê kerê sisêyan, kezeba Serhad reş kiribû. Her sed dused gavî diçû, diket xwarê û mexel dihat. Heta Serhad bi serê xwe barê wî rast dikir û ew radikir ser lingan, pişta wî diket ber wî.

Serhad di dilê xwe de her nifir dikir û sûnd dixwar, ku vê carê kerekî baş ji xwe re bikire. Ji ber ku aboriya Serhad li ser firotina êzingan bû û ev tişt her car dihat serê wî.

Serhad gihişt bajêr, êzingên xwe firotin û berê xwe da xana ku her gav diçuyê. Silav li xwediyê xanê kir, her sê kerên xwe bi singan ve girêdan û ber bi çarşiya canbaza çû. Ew li nav kerên ku li mazatê bûn geriya û yek ji wan kete serê wî. Kerekî wek bergîrekî bû. Rewşa wî baş xuya dikir. Ji bo ku, ji kerê xwe gelek tirsiyabû, bazarek taybetî bi xwediyê kerê re kir:

- Heyran, ez li kerekî baş digerim. Ez her roj êzingan tînim bajêr. Rewşa kerê te baş xuya dike,

lê dîsa jî dixwazim bazara xwe baş bikim. Eger kerê te qelp û zexel be, ez ê wî bi şûn de vegerînim.

Xwediyê kerê bê ku li ser bifikire, bi carekê bersîva Serhad da:

- Bi Yezdanê jor, tu kerekî wiha xurt û li ser xwe, zor dibînî. Heta sibê ji te re mohlet û di dilê xwe de jî got: " Ma tê çawa pê derxînî, ku kerê min zexel û qelp e. Ev der ne gund e, ku tu barê êzingan li wî bikî û pê derxînî ku kerê min ne weke qilafetê xwe ye. Ji xwe, gava tu sibê dîsa werî bajêr, tu dê min li vir nebînî."

Serhad bêyî ku dirêj bike jê re got:

- Ez bawer nakim ku pêwîst be tu heta sibê mohletê bi min dî. Eger kerê te qelp û zexel be, ez dê zû vegerim.


Serhad xatir ji xwediyê kerê xwest û ker ber bi xanê ve ajot. Demekî dirêj derbas nebû, Serhad paş de vegeriya, hate mazatê. Hîn xwediyê kerê li wê derê bû. Ew li bendê bû ku kerên xwe yên din bifiroşe. Serhad hat cem wî û jê re got:

-Birako, kanî perekên min û ji te re kerê te! Kerê te him zexel e û him mexel e.

Xwediyê kerê bîhna xwe teng kir û got:

- Ez kerê xwe paş de venagerînim. Kerê min kerekî gelekî xurt e. Ma tu lê nanerî, ew weke qantirekî ye. Tu bi çi awayî dikarî vî tiştî ji bo kerê min bibêjî?

-Heyran ne pêwîst e, ku em serê hevdû biêşînin. Kerê te ne li gor qilafetê xwe ye û ne jî weke ku tu pesnê wî didî ye.Kanî perekên min.



Ez naxwazim derûdor dengên me bibihîzin û ne lazim e, ku ez te bikşînim heqiyê.

Xwediyê kerê bewerî pê anî, ku ew ji destê Serhad nafilite. Lê di dilê wî de jî bûbû kul. Gelo, bi çi awayî Sehad tê derxist, ku kerê wî qelp û zexel e? Xwediyê kerê vegeriya ser Serhad û ji wî re got:

-Baş e. Ez dê perên te bidim. Lê bi şertekî. Divê tu ji min re bibêjî, bê te bi çi awayî tê derxist, ku kerê min qelp û zexel e.

Serhad hinekî mizmizî û bersîva pirsa wî da:

- Eger ev be, ev gelekî hêsan e. Sê kerên min hene û niha li xanê girêdayî ne.Yek ji wan gelekî xurt e, ço nagihîne xwe. Yek jî ne weke yê xurt e, le ne pir xerab e jî. Lê yê sisêyan him zexel e û him mexel e. Her gava ku ez wî tînim bajêr, kezeba min pê re reş dibe.

Gava min kerê te bir xanê; pêşî kerê te û yê min yê herî xurt hevdu bîhn kirin. Demek dirêj derbas nebû, wan paşiya xwe dan hevdu û bi zîtokan hatin hev. Dûre, wî û kerê min yê duyem hevdû bîhn kirin. Wan jî li hevdû nekirin û paşiya xwe dan hev. Lê gava dor hat ser kerê min yê siyem, yê ku him zexel û him mexel e; te digot qey ew destbirakên hevdû yên eskeriyê ne. We gavê min tê derxist, ku kerê te ji sefê kerê min yê zexel û mexel e.

Serhad perên xwe paş de girtin, xatir ji xwediyê kerê xwest û berê xwe da xanê.

# MIRIYÊ DEHPERAN

Suphî û Hemo destbirakê hevdu bûn. Suphî bajarî bû, Hemo jî gundî bû. Herdu heval dadikevin beriyê ku ji xwe re karekî bibînin. Li gundekî beriyê li malek xewle dibin mêvan. Piştî şîvê, herdu destbirak bi mazûbanê xwe re diherin odeya gund ya Hecî Hadî.

Li odeya Hecî Hadî, weke her şev civat baş geriyabû. Navmaliyê Hecî Hadî qahwa tahl li gundiyan digerand. Ji dûxana cixaran mijek tenik xwe bera ser civatê da bû. Her sê zilaman silav li civatê kirin, çend kes ji rêza pêşiyê rabûn ser xwe û cih dan wan. Hacî Hadî xêrhatin di wan hilda û ji mazûbanê wan Ûso pirsî:

- Ûso! Ma mêvanên te ji ku ne?

- Ez benî, yek ji wan bajarî ye û camêrê din ji deştê ye. Ew ji xwe re li karekî digerin.

Hecî Hadî ji wan pirsî:

- Gelî camêran ma çi kar ji destên we tê ?

Yê bajarî got:


- Axayê min, ez dikarim hewşê bimalim û karê nav malê bikim.

Hemo jî got:

- Ez benî, weleh min bi sala gavantî kiriye. Eger gavanek ji we re lazim be, bawer bikî ez nayêm şekala haziran, lê yekî mîna min zehmet tê dîtin.

- Baş e. Lê bazarek min heye: Roja we her yekî bi nîv qurişî. Yek ji we rêxa êxur bavêje û yê din jî here ber çêlekê.


Bazar hate qebûl kirin. Sohbeta civatê bi ser-



pêhatî û pêkenînên gundiyan berdewam kir.

Bi berbanga sibê re, Hemo çêlek ji êxur derxist û berê wê da çolê. Suphî jî rahişt bêrê, selikê,

melkesê û daket êxur. Lê çi bibîne! Axur heta ber beşta tije zibil e. Qudûmê wî şikest û baweriya xwe pê anî, ku bi kişandinê ev kar naqede.



Lê teva vî awayî jî mecbûr bû, ku dest bi kişandina zibil bike.

Rewşa Hemo, ji ya wî ne xweştir bû. Ohoo

ohoo ya wî bû û bi dû çêlekê de dibeziya. Lê, dikir û nedikir nedigîhişt çêlekê. Di Pirmîrê re, di gundê Hecî Elî re, di Şêxê Reş re û di Kilêbînê re vegeriya Girbeşkê û hat Salikê. Hemo hingî westiya bû, ji hal de ketibû. Xwêdanê di pişta wî re avê-tibû, ziman di devê wî de zuha bûbû û xweziya xwe bi zorê dadiqurtand. Wî di dilê xwe de got: "Ez ê sibê yê bajarî bişînim ber çêlekê." Suphî jî di dilê xwe de di got: "Ez ê sibê birakê xwe Hemo di ber vê rêxê xînim. Bila ew jî, ji vê xêr û berekêta ku ez tê de mame, bê par nemîne."

Bi êvarî re Hemo çêlek di ber de, ket devê deriyê hewşê. Suphî baz da pêşiya wî û jê pirsî:

- Tu bi xêr hat birako. Ma karê te çawa bû? Tu pir betilî xuya yî.

- Na weleh. Bi serê te ez xenê bûm. Li wan mêrgan û li ber wan çeman ez di xêra Xwedê de mabûm. Ma gelo tu di çi halî de bû?

Suphî di bin simêla de dikeniya û li birakê xwe vegerand:

- Weleh, ez wek tiralên Bexdayê li ber siya êxur rûniştim û min tu kar nekir.

Hemo jê re got:

- Baş e, birako. Ez ê sibê jî herim ber vê çêlekê. Lê dusib dora te ye.

Wî bi vî awayî dixwest, ku Suphî li çûna ber çêlekê bêtir sor bike. Gava Suphî ev gotin bihîst, di dilê xwe de got: "Ahaa, bi Xwedê firset dike ji destên min here. Çavê vî kuçikbavî lê ye, ku ez sibê jî di nav vê rêxê de vegevizim". Loma jî, bi

dengekî liberger ji Hemo re got:

- Na, bi serê te yê delal, ez tu carî wanî qebûl nakim. Ez di vî hundirî de, ji betaliyê aciz bûm. Tu jî hinekî betilî xuya yî. Tu sibê ji xwe re heta êvarî li ber siya êxur pal de. Divê ez jî hinekî kar bikim. Ma em birakê hevdu yên çi ne ?

Hemo weke yekî ku dilê wî bi Suphî bişewite û bixwaze qenciyekê pê bike, got:

- Baş e. Lê, başbazirganê salê wê sibê were ser kaniyê. Kaniyak li vê jorê ye. Min soz daye wî ku ez ê barek êzing li pişta xwe bikim û jê re bibim. Ew jî wê zêrekî bide min. Roja me her yekî bi nîv qurişî ye. Bi vî pereyî, em ê çi xweliyê li serê xwe kin. Eger tu vê soza ku min daye başbazirgan bi cih bînî, xem nake; wê gavê tu dikarî sibê herî ber çêlekê.

Serê sibê, Suphî li derdora hewşê geriya, lê tu êzing nedît. Gazî hevalê xwe kir û rewş jê re got. Hemo ji wî re got:


- Lawo, Suphî! Ka tu êzing nexuya ne. Eger em êzingan ya jî di dewsa wan de tiştekî şewatê negihênin başbazirgan, divê em wî zêrî ji bîr bikin. Ya baş ev e, bê ku kes me bibîne, tu deriyê hewşê ji ber bikî û ez ê bi werîsekî li pişta te bijdînim. Derî di dewsa êzingan de bibe.

Suphî deriyê hewşê ji ber kir. Hemo ew bi werîsekî li pişta Suphî baş şidand. Çêlek ji êxur berda û ji birakê xwe re got:

- Riya te vekirî be. Tu li çêlekê baş miqate bî ha!

Yê bajarî derî li piştê da dû çêlekê. Lê, rebeno

dikir û nedikir nedigîhişt wê. Çêlekê weke her gav berê xwe da riya gundan û belengazê Suphî jî her bi dû wê de baz dida. Gelek derbas nebû,



feqîro ji hal ket. Ji tirsa ku çêlekê wenda bike, nekarîbû ji dû wê jî vegere. Hêdî- hêdî hişê Suphî hat serê wî ku bê birakê wî çi aniye serê wî.

Piştî Suphî da ser oxura xwe, Hemo jî bi kêfek mezin berê xwe da êxur, da ku ew jî wek yê bajarî hinekî "tiraliyê" bike. Gava paldana ber siya êxur dihat bîra wî, devê wî diçû paş guhê wî. Bi vê kêf û heviyê gihişt ber devê deriyê êxur. Dema ku serê xwe dirêjî hundir kir, rûyê wî pê re hat guhertin. Çongên wî lerizîn û heft xwezî bi karê xwe yê do anî. Lê ji bêçaretî, wî jî selika xwe da ber rêxê û dest bi kişandina rêxê kir. Bikşîne, ha bikşîne! Heta êvarî pişta wî kete ber wî û di ber xwe de jî her digot:

- Weleh, Suphî efendî rast digot. Maşeleh min li ber siya êxur xweş pal daye.

Ber bi êvarî Hecî Hadî ji odê daket hewşê û lê hay bû, ku deriyê hewşê ne li ber e. Bi awakî hêrs û şaşmayî ji Hemo pirsî:

- Lawo Hemo, ma ka deriyê hewşa me ?

Hîn Hemo difikirî, ku çi bersîvê bide, Suphî derî li pişta wî û ziman ji dev kişyayî bi dû çêlekê de ket hewşê. Hecî Hadî nema dizanîbû bê çi qewimî ye. Ji Suphî pirsî:

- Kuro, ma tu dîn bû yî, ev çi derî ye li pişta te ye?

Yê bajarî ji hêrsa peyv nedigîhandin hevdu û bi zorê bersîv da:

- Axa, ez xulam, ji xwe îmana min hatiye serê bêvila min. Çêleka te ez gund bi gund gerandime. Ez bûm şadîkê şivan, gavan û bêrîvanên çolê. Hevalê min mala min xerab kir. Mêrg û kaniyên wî serê wî bixwe.

Suphî derî ji pişta xwe danî, çêlek bir êxur, ew

bi singekî ve girêda û vegeriya odê. Wî ji westiyanê ta girtibû û xwe li ser kulavê odê dirêj kiribû. Hemo ji fedya nizanîbû bê çi bibêje. Taya hevalê xwe kir mane û ji Hecî Hadî re got:

- Heyran tu dibînî ku hevalê min nexweş e. Ez pir ditirsim ku ev mêrik li vir, di nav lepê me de bimre. Ya baş, tu perekê me bidî me. Em dê sibê heta nîvro jî, ji te re bixebitin. Dûre, eger tu destûra me bidî, ez ê birakê xwe bibim mala wî, nav zarokên wî.

Ji xwe Hecî Hadî jî gelekî ji wan aciz bûbû û ji Hemo re got:

- Karê we serê we bixwe. Ji we re du quriş û nîvê we û ne pêwîst e, ku hûn heta nîvro jî bixebitin. Destûra we bi we re û sibê ez we li gund nebînim!

Herdu heval, bi berbanga sibê re ji Salikê derketin. Bi rê de perê xwe li hev parê kirin. Her yekî qurişek girt. Lê nîv quriş di navparê de ma. Ji ber ku perê hûr tunebû, her yekî nedikarîbû deh perê xwe bigirta. Suphî ji Hemo re got:


- Birako! Gava em bighêjin bajêr, ez ê vî nîv qurişî hûr bikim û deh pera bidim te.

Bi vî awayî li hev kirin û riya xwe domandin. Bi rê de, li bîrekê rast hatin. Li ber bîrê sekinîn. Hemo ji Suphî re got:

- Birako, baş bû ku em li vê bîrê rast hatin. Ji tîna qirika me zuha bûbû. Divê yek ji me dakeve binê bîrê.

Yê bajarî got:

- Weleh, ez newêrim dakevim binê bîrê. Ka tu



pişta xwe veke. Em dê pişt û desmalên xwe bi hevdu ve girêdin û ez ê te daxim binê bîre. Tu têr avê vexwe, kumê xwe jî ji min re tije av bike, dûre ez ê te bikşînîm jor.

Destmal û piştên xwe bi ser hev girêdan, kirin wek werîsekî û Hemo xwe bera binê bîrê da. Dema ew gîhişt binê bîrê, çi bibîne! Sindoqek tije zêr û mecîdî di binê bîrê de ye. Hemo tîbûna xwe ji bîr kir, rahişt sindoqê û ji hevalê xwe re got:

- Birako, em tê de man. Min sindoqek tije zêr û mecîdî dît. De min zû bikşîne jor!

Gava Hemo bi rûkarê devê bîrê ket, yê bajarî dada sindoqê û hevalê xwe bi şûnd de dahf da, bera binê bîrê da. Hemo di dilê xwe de got: "Te dît min bi destên xwe çi anî serê xwe".

Bi zehmetiyek gelek mezin Hemo ji bîrê derket. Roj çûbû ava. Dinya hedî hêdî tarî dibû. Li derdora xwe nerî, kesek nedît. Ji xwe re got: "Ya baş ew e, ku ez weke kera bizirim, hela bê ev segbavê Suphî li min venagere."


Hemo dest pê kir weke kera ziriya. Gava dengê zirandina "kerekî" hate Suphî, gelekî kêfa wî hat û ji xwe re got:

- Weleh ev pir baş bû. Ez pir betilîme. Wa ye kerek tê. Hem ez dê li wî siwarêm û hem jî ez ê sindoqa xwe lê bikim.

Wexta ku ew nêzîkî hevdu bûn, Suphî lê nerî ku birakê wî ye. Hemo çend xeber jê re dan. Lê yê bajarî li ber dilê wî geriya û li hev hatin. Paşê, sindoqa xwe vekirin û zêr û mecîdiyên di sindoqê de bûn, li hev parê kirin. Piştî xatir

xwestinê, Suphî berê xwe da bajêr û Hemo jî berê xwe da gundê xwe.

Hemo bi xêra wan peran, bû zengînê gund.




Lê, destên xwe li peran negirt û bi bolvirî vir de wê de avêt. Bi vî awayî, dawiya peran zû anî. Dema ku zivistanê devê derî girt, qurişek pere li

mala wî nemabû. Ew û pîreka xwe bi ser hevdu de ponijîn. Bîstekê wiha man û dûre pîreka wî bêdengî xera kir û ji Hemo pirsî:

- Mal şewitiyo, ma ewqas perê te hebûn. Te hemû çawa kir? Ma qey tu deynê te li kesî tuneye, ya jî tu birak û dostên te yên ku bikaribin vê zivistanê li ber barên me rabin nînin?

Ji nişka ve deh perê wî yê li bajarî mabû hat bîra wî û bi kêf ji pireka xwe re got:

- Ha ha, hat bîra min. Deh perê min li yê bajarî mabû. Ez ê îro herim bajêr, perê xwe ji cem wî bînim.

Hemo ji malê derket û berê xwe da bajêr. Li bajêr, li mala birakê xwe pirsî. Birakê wî gelekî zengîn bûbû. Yekî, dikanek ne serî û ne binî rê Hemo da û got:

- Ev dikana birakê te ye.

Lê, birakê wî bi xwe ne li ber dikanê bû. Karkerek li dikanê dixebitî. Wî da pêşiya Hemo û ew bir ber deriyekî mezin. Bi şiklê lêxistina derî, Suphî ket şikê û ji pîreka xwe re got:

- Xanim hela binêre, bê ew ne hevalê min yê gundî ye? Deh perê wî li min bû. Ez bawer im, ew hatiye perê xwe. Ji wî bipirse, heger ew be, bêje birakê te mirî ye.


Jinik hate devê derî û ji Hemo pirsî. Piştî ku jinikê nas kir ku ew birakê mêrê wê ye, kelogirî bû û jê re got:

- Ma ne birakê te mirî ye.

Mêrik dizanîbû, ku ew dek û dolab in. Wî birakê xwe baş nas dikir. Loma jî, ji jinikê re

got:

- Xwakê, tu ji kerema xwe re derî li min vekî. Hema qet nebe ez kincên wî an jî nivînê wî



bibînim. Bi kêmanî, niha bêhna wî jê tê. Jinik bi lez vegeriya û ji mêrê xwe re got, ku birakê wî weha dibê.

Suphî li pîreka xwe vegerand:

- Derî li wî veke, bila were hundir. Ez dê weke miriya di nav nivîna kevim.

Suphî xwe wek termekî di nav nivîna de ramedand. Hemo hat ber serê wî rûnişt û di guhê wî de got:

- Kuro, ka rabe ser xwe û deh perê min bide min. Ma ne şerm e, ku ji bo deh pera te xwe xistiye nav nivîna? Ma qey ez te nas nakim. Tu ewqas zengîn bûyî, lê dîsa jî çavên te birçî ne.

Hemo destê wî bilind kir, Suphî ranebû. Lingên wî bilind kirin, ranebû. Derzî di wî de rakir, lê dîsa feyde nekir. Bîhna Hemo teng bû, derket ser balkonê, ku cigarakê bikşîne. Gava ew li ser şaneşînê bû, lê nerî ku Ebdulxefûr Efendiyê ku miriyan dişo di kuçê de derbas dibe. Bi dengekî bilind gazî wî kir:

- Ebdulxefûr Efendî! Ebdulxefûr Efendî! Miriyekî me heye. Ma tu wî naşo ?

Ebdulxefûr Efendî li Hemo vegeriya, serê xwe ber bi şaneşînê bilind kir û got:

- Çima ez neşom. Ma karê min çi ye?

Herdû hatin hundir. Suphî li ser textekî danîn û dest bi şuştinê kirin. Tasek ji ava kelandî lê dikirin û yek sar jî bi ser de dadikirin...Deng ji dîwêr derdiket, lê ji Suphî dernediket. Hemo di nav re jî, bi bergerandî ji wî re digot:

- Lawo, weleh tu sax î. Me tu bi saxî kuşt. Rabe ser xwe, deh perê min bide. Dereng e, bû êvar .Divê ez herim malê. Lê, dîsa tu bersîv negirt û Suphi her xwe li mirîtî datanî. Hêviya Hemo her

ku diçû qels dibû. Suphî şuştin û xistin nava kefen. Dûre, Hemo ji pîreka wî re got:

- Birakê min wesiyeta xwe li min kiribû. Gorî wesiyeta wî, divê ez wî di naoza binya bajêr de veşerim.

Ebdulxefûr Efendî jî got:

Weleh, ev fikrek ne xerab e. Ji xwe zivistan e û kolandina erdê jî pir zahmet e.

Hemo, birakê xwe avêt ser milê xwe û berê xwe da naozê. Hat ber devê naozê û bi kerb û kîn ew avêt binê wê. Dîsa jê re got:

- Lawo, rabe ser xwe. Weleh ez dizanim ku tu ne miriyî. Deh perekê min bide min, ez herim mala xwe. Lê, dîsa jî tu deng ji Suphî nehat.

Hîn Hemo heviya wî hebû, ku birakê wî dev ji vê serişkiyê berde; dengek ji ser tahta naozê hat. Gava Hemo zivirî, dît ku komek însan ketin hundir naozê. Wî ji tirsa, xwe xiste bin "meytê" havalê xwe û li wan kesên ku hatibûn hundirê naozê guhdarî kir.

Ew diz bûn. Wan xezîna dewletê vekiribûn û teva zêr û perên ku dizîbûn hatibûn wir, xwe veşêrin. Yekî di nav wan de, şûrekî nuh ji xwe re kirîbû. Ji kêfa pera re, nema zanîbû wê çi bikira. Ji nişka ve şûrê xwe ji kalan kişand û got:

- Ez dixwazim şûrê xwe biceribînim. Hela bê çiqasî tûj e. Ya baş, ez şûrê xwe li vî meytî biceribînim.

Ew hat li ser "meytê" Suphî sekinî û şûrê xwe bilind kir ku lêxe, ji tirsa barînî bi Suphî ket. Xofek mezin kete dilên dizan û bi lez û bez ji

naozê baz dan. Yê bajarî rabû ser xwe û ji birakê xwe re got:

- Te dît birako! Min çi xêr û bereket çêkir. Eger min weha nekiriba, ev pere ne dibûn qismetê me.

Suphî û Hemo ew pere bi kêfxweşî li hevdu par kirin. Piştî bîstekê, diz jî li derve li hev civiyan û ji hev pirsîn:

- Ma ew çi bela bû hate serê me? Kê ji we ev bêrêtî kir?

Yekî ji nav dizan got:

- Remo Hûro bû. Wî xwest, şûrê xwe li miriyan biceribîne. Ma ceribandina şûrê wî ne li ser miriyan ba, nedibû!

Piştî diz bi hevdu şêwirîn, wan biryar dan, ku Remo Hûro vegere naozê û binere bê çi qewimî ye. Bê bi rastî mirî rabûne ser xwe ya jî hinekan bi qazî li wan weha kirin! Hevalên Remo Hûro ew baş tembîh kir û jê re gotin:

- Divê tu herî naozê baş sax bikî û zû vegerî!

Remo Hûro bi tirsek mezin berê xwe da naozê. Çongên wî dilerizîn, gupe gupa dilê wî bû. Gava bi tirs serê xwe dirêjî hundirê naozê kir, Suphî xwe çengî kumê wî kir. Kum ji serê wî kir, da destê Hemo û got:

- Lawo, ehaa ev jî di dewsa deh perê te de. Ma tu hîn çi dixwazî?

Ji tirsa, ziravê Remo Hûro qetiyabû. Bi bazdan li hevalên xwe vegeriya. Devê wî li hev geriyabû û bi zorê gotin ji dev derdiket:

- Lawo bazdin! Lawo birevin! Mirî hemû

rabûne. Wan perên me li hevdu parê kirine û her yek deh pere para wî ketiye. Tew yek j ji wan jî



bêpar mabû. Kumê min ji serê min kirin û di dewsa deh pera de dan wî.

# DERGÛŞ

Rojek ji rojan, lawekî Sîno çêdibe. Pîreka wî jê re dibê:


- Sîno, divê tu herî cem xerêt, dergûşekê ji bo lawikê me bidî çêkirin.

Sîno berê xwe dide dikana xerêt. Jixwe, hew xeratek tenê li wê derê hebû. Destê wî hinekî giran û bîhna wî jî gelekî teng bû. Gava Sîno dighêje cem xerêt, silavê lê dike û wê daxwaza xwe jê re dibêje. Berî ku ji dikanê derkeve, perê dergûşê dide xerêt û hinekî jî lava dike, ku dergûşê zû çêbike.

Lê mixabin teva ku Sîno ji çend rojan carekê diçû cem xerêt û jê dipirsî jî, her gav ew dest vala bi ser malê de vedigeriya. Xerat carna bîhna xwe teng dikir û digot:

- Heyran, dibê tu weha li min ecele nekî. Tu dizanî gelek kar li ser min heye û ez jî dixwazim ku rojek berî rojekê dergûşa te biqedînim.

Ew lawikê ku wê dergûş jê re çêbiba mezin dibe, tê kemala zewacê, dizewice û piştî salekê zarokek jê re çêdibe. Şahî û kêfxweşiyek mezin dikeve nava mala Sîno. Ji bo torinekî Sîno çêbûye, ew gelekî bi kêf dilşad e. Dîsa dergûşek pêwîst e. Pîreka Sîno daxwaza dergûşekê dike. Lê vê carê ji bo nebiyê xwe. Sîno ji lawê xwe re dibêje:



- Kurê min, gava tu hatibû dinyê, min dergûşek ji bo te danîbû ser xerêt û pereyên wî jî pêşin dabûye. Tu bi lez here cem xerêt, silavên min jî lê bike. Maşalê wî ew dergûş çêkiribe.

Lawê Sîno bi kêf dihere dikana xerêt, silavê li wî dike û dibêje:

- Apo, gelek silavên bavê min li te hene. Gava ez hatibûm dinyê, wî ji bo min dergûşek danîbû ser te. Niha xulamê te be, lawekî min çêbû. Ez hêvîda im ku te ew dergûş çêkiriye.

Xerêt got:

- Xortê delal, weleh hîn min ew dergûş çênekiriye.

- Apê delal, ez heyrana çavê te me, tê destê xwe hinekî sivik bigrî û wê dergûşê zû çêbikî. Tu dizanî zarok bê dergûş nabe...


Gava xort weha got, bîhna xerat teng bû û bi hêrs ji xort re got:

- Heyran, eger tê jî weke bavê xwe li min ecele bikî, fermo perê bavê te û ez tu dergûşa çênakim.

# BERAZ

Rezê mirovekî hebû. Wî ji rezê xwe pir hez dikir. Cotê rez di wexta wê de dajot. Eşêva nav rez ji bîr nedikir. wî gelek cûr mêw çandibûn. Lê mixabin berazek fesidîbû rezê wî û nedihişt ew tu tirî jê bixwe.

Gelek caran, ew bi şev li ber rez dima ku wî berazî ya bigre ya jî bikuje. Lê wê jî feyde nekir. Xwediyê rez, rojekê çalekê di nava rez de dikole,



devê çalê bi hejik û çilo vedişêre, ku beraz têkeve wê çalê û bi wî awayî ji wê belayê xelas bibe.

Xwediyê rez sibê zû tê nav rez û dixwaze li feqa xwe binere. Gava digihêje ser devê çalê çi

bibîne! Ew berazê ku diket rezê wî, di çalê werbûye. Ji kêfa devê wî tê ber guhên wî. Hingî dabû dilê wî, radihêle darekî dirêj û bi wî darî bi beraz dikeve. Di ber xwe de jî dibê:

- Ma tê vê carê bi ku de xelas bibî ?

Xwediyê rez bê rawestandin li beraz dixe.



Çiqasî lê dixe jî, dilê wî rehet nabe. Lê dûre, lingên wî dişemitin û ew jî dikevê çalê, cem beraz. Ew ji beraz ditirse û beraz jî, ji wî. Beraz xwe ber bi jor çeng dike ku xwe bi ser derê çalê xîne. Xwediyê rez jî, her ku beraz xwe çeng dike, destê xwe dide bin wî, bilind dike û di ber de jî dua dike:

- Yarebî tu vê carê jî li vî heywanê bêguneh bihata rehmê! Yarebî tu vê carê jî li vî heywanê reben bihata rehmê...

# TAHSÎLDAR Û KER

Rojekê tahsîldarek dihere gundekî berîyê. Ji tirsa, her yek bi aliyekî ve direve. Ji ber ku di wê demê de qaçora serê terş û heywanan hebû. Gundîyên feqîr bi kotekî xwe xwedî dikirin. Ew qaçor ji wan re gelekî giran dihat.

Weke her car, gundiyan vê carê jî terş û heywanên xwe bi lez û bez ji nav gund derxistin. Ew li paş girikan û di çem de veşartin.

Lê mixabin vê carê xeber dereng digihêje Çelo. Ji bo wê jî, nagihê ku kerê xwe ji nav gund derxîne.

Çelo ji bo qaçora kerê nede, dihere êxur, kerê ji êxur derdixîne, tîne aliyê malê û her çar lingên kerê bi verîsekî baş girêdide. Doşekekê davê erdê, kerê dixe nav û lihêfekê davê ser.

Tahsîldar mal bi mal digere. Çi heywanên ku dibîne, qaçora wan bi zor ji xwediyê wan distîne.

Dor tê ser mala Çelo. Ew ji tirsa dikeve hev. Lê naxwaze vê tirsa xwe bide xwiyanê kirin.

Tahsîldar li hewşê, axur û xanîkê êgir digere, lê tiştekî nabîne. Ew derbasî aliyê malê dibe, li we derê jî tu heywanan nabîne. Gava ew dê ji malê derkeve, lê hayî dibe, ku kesek di nav nivîna de ye.Tahsîldar dizane, ku însanek bi roj di nav nivîna de be, tê wê manê ku ew kes nexweş e. Ji bo wê jî, tahsîldar ji Çelo dipirse:

- Xêr e, ma ew kî ye nexweş e?

Çelo bi dengekî melûl dibêje:

- Heyran, weleh ew bavê min e.

Tahsîldar dihere ser nivîna, dixwaze li rewşa



yê nexweş binêre û dibê:

- Hela ez li  apê xwe binêrim, bê çawa ye.

Gava Tahsîldar lihêfê radike, çi bibîne! Kerek di nav nivîna de ye. Dibe tîq- tîqa Tahsîldar. Ew dizîvire ser Çelo û dibê:

- Heyran, ji bona ku ev camêr bû bavê te û apê min, bi Xwedê ez jî qaçora vî ji te nastînim.

# GRAMAFONA APÊ QADO


Apê Qado mirovekî jîr û zana bû. Di dema wî de, erebe pir tune bûn. Gelek gundiyên wî, hew gava cuzdanê xwe yê nifûsê derxistibûn, qeza xwe dîtibûn. Piraniya wan tu bajarên mezin nedîtibûn. Ji salê carekê ya jî du caran hinek ji gundiyan diçûn qezê û asûkên hemû gundiyan dikirîn. Carna jî, kaçaxçiyan ji bo firotinê cil û caw ji Binxetê dianîn gundan û gundiyan pêwistiyên xwe ji wan dikirîn.

Lê Apê Qado ne weke gundiyên din bû. Kêfa wî gelekî ji gerê re dihat û ew çûbû gelek bajarên mezin. Heta ew çend caran çûbû Enqere û Stenbolê jî. Her cara ku Apê Qado ji bajarên mezin vedigeriya, gundî li wî kom dibûn û wî jî serpêhatiyên xwe ji wan re digot.

Carekê Apê Qado dihere Enqerê, li wê derê gramafonê dibîne. Kêfa wî gelekî ji gramafonê re tê û yekê dikire. Heta wê çaxê jî, hîn gramafon nehatibûn navçeya Apê Qado. Mirovên li wê derê tiştekî weha neditibûn.

Gava Apê Qado ji Enqerê tê, bihar bû. Erd ji giha, nefel û çîçekên biharê hatibû xemilandin. Ji aliyekî şivan, gavan û berîvanan, ji aliyê din jî terş û dewarên wan xeml û xêza biharê dewlementir dikirin. Zarokên gund li derûdora çem li qîvar û kerengan digeriyan. Hinekan jî di nava zadan de baqil didan hevdu.

Berî ku Apê Qado bigihêje gundê xwe, gramafona xwe li ser kerekê baş dijdîne, sêlikekê dide ser û gramafon dest bi muzîkê dike. Ew hinekî ji



dûr ve dide dû kerê û dimeşe. Gava şivan, gavan, bêrîvanên li çolê dibînin ku kerek tê û distirê, şaş û mat dimînin. Ji ber ku heta wê gavê jî, wan tiştekî weha nedîtibûn. Gotin û nesîhetên melên wan tên bîra wan û bawer dikin ku tercal rabûye. Her yek ji tirsa bi aliyekî ve direvin û dikin gazî:

- Hewarê tercal rabû, hewarê tercal rabû...

ISBN: 91-87730-50-2

1993

Weşanên APEC